

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal: 1981

hejmar: 2

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

Xwendevanên delal,

Hejmara didwan ya KULÎLK-ê divyabû berî niha bi çend mehan bihata weşandin. Lê mixa bin, ku tune bûna peran bû sebebê bi derengî çapkirin û weşandina vê hejmarê.

Wek hun jî dibînin, hem mezinahiya kovarê û hem jî ya tîpên nivîsaran hatine guhartin. Me wilo kir, da ku çapa kovarê erzantir bibe mal. Dibe ku ne bi dilê we be. Lê em hêvîdar in, ku hun rewşa me têbigihên.

KULÎLK pir dilgir û balkêş bû. Ji bilî dilgirî û balkêşiyê, KULÎLK-ê bal û dêna gelek kesan kişan de ser pirs û pirsgerêkên zarokan. Heta bi îro jî, pir dîtî û baweriyên me yê çewt li ser zarokan hene. Em pir caran mezinkirin, lêbanîn, jêhezkin û perwerdekirina wan diavêjin piştguhên xwe. Pir pûte pê nadin. Heta hebûna wan ji xwe re "bela" dihesibînin. Ew her çî ku bikin, em dibêjin: "De zarok e lo !" Lê ev pir şaş e. Divê em dev ji vê nezani û serhişkiya xwe berdin. Divê em tu caran ji bîr ve nekin, ku ew çêkrox û karbi-destên sibehî yê welatê me yê bindest in. Ji ber vê yekê pîrsa mezinkirin, lêbanîn, jêhezkin, perwerdekirin û hwd. ya zarokan, pirseke bingehîn û berbiçav e. Heke KULÎLK bikaribe di vî warî de alîkar be, dê xwe pir serfiraz bihesibîne.

Bi hêviya guhpêdan û bi serketina zarokan !

K U L Î L K

Ez kurê tang û top, min divê qîr û ceng  
Ez kurê tîp û kom, min divê nav û deng

Bo me her dem divê pêşveçûn û xebat  
Koletî min navê, min divê tim felat

*Cegerxwîn*



# QUNCIKA NAMEYAN

\*\*\*\*\*

Ji bo apên dilovan ên berpirsiyarên KULÎLK-ê,  
Ez bi dîtina KULÎLK zêde kêfxweş bûm û min xwest  
ez dîtina xwe ya Kurdistanê bi rengekî, ku hun di  
KULÎLK-ê de bikarin biweşînin, ji we re bişînim,  
da mîna min her yek ji Kurdistanê hez bike.  
Silavên xwe pêşkêş dikim û daxwaza min e, demeke  
zû KULÎLK bigihê destê min.

15. 11. 1980

FIRAT A.

(14 salî)

SALZGITTER - Elmanya

## DÎTINEK JI KURDISTANÊ

Ez û dê û bavê me

Di gel her çar birayên me

Di destpêka biharê

Li dawîya Avdarê

Bihareke xweş û rengîn

Em li rêkê dimeşîn

Çiya û deşt û newal

Bi me re dibûn heval

Bavê me em xirandin

Li cih û waran gerandin

Şev dirêj û roj fire

Ta xilas bû riya me

Em gihane KURDISTAN

Deşt û çiya û zozan

Bavê me ax dikişand

Diya me serê xwe dihejand

Ji wan rondik bariyan

Didan girî,dizariyan

Em birak li hev heyîrîn

Lêvên me jî direilîn

Çiyayên bilind û bê dar

Gundên piçûk û kaviên sar

Ew bû cihê bav û kalan

Warê me yê hezar salan

Dê û bavê me ji mer got

Xwînmêjan welat li me firot

Min zaniya em çî ne

Û çî bû ji dê û bavê min e

Bi dîtina welêt em xweş bûn

Em meşiyên û geş bûn

Teyr û çivîk ji me firîn

Bilind dibûn û dikenîn

Ez Firat bûm min nezanî ew çî ye

Min Firat dît,min dizanî hîvî ye

Çemekî delal,gelekî dirêj û fireh

Min lê meyzand,têr nebûm jê bi reh

Li Ruhayê min nêrî bi çavên zelal

Bi wan latan,cih û warên pir delal

Em xiriyan Hêlwan û Siwêrekê

Min pir nedîn ji aliyê kêlekê

Em bihirîn serjêrî Amedê  
 Bêhnên ji kûr,ew ê li pozê me dê  
 Çemê Diclê diçû û li hev herbilî  
 Gelek şîrîn xuya dikir li vî dilî  
 Ji wir pê de em gihane Farqînê  
 Av û kahnî,dar û berên lê kemînê  
 Malên kevn û bi kevirên reş  
 Meriv lê dibit xweş û geş  
     Kaniya derge,kaniya mezin min didîtin  
     Gul û kulîlk ji dora wan min çinîtin  
     Li wir min dît Birca Belek  
     Kela Zembîlfiroş ya bi xelek  
 Çûm nav gedan ez leyîstim bi dilek xweş  
 Min kurek dît bi cilên nû û solên reş  
 Min jê hez nekir û min ew dehfand  
 Li bin guhê min du şimaq dikişand  
     Hevalan got: Çi dikî? Bila bileyîze  
     Malmezin e,ew ji mala Ezîz e  
     Tê qiyametekê rakî li vê derê  
     Apê wî rûdinê li Enqerê  
 Min got: Çima ew nû,hun tazî ne  
 Çima bi vî halî hun tev razî ne  
 Apê wî çûye Enqerê bo navê xwe  
 Ez lê dixim,lê çî dibe ji we  
     Em tev mîna hev bin li vir,li malê  
     Bi hev re bileyîzin,bi Xezal,Delalê  
     Bi hev re em bileyîzin,bi xweş û beş  
     Em ne xwas bin,ew jî ne bi solên reş

Ji wir em daketin çûne Batmanê  
Av û avşol, herî pir bû li meydanê  
Di kuçan de, li bin dîwaran em meşîyan  
Hin ji me şemitîn, ketin, êşîyan

Em çûn mala kalê min ê kevnar  
Dîwar nizim, serî girtibû bi dar  
Min kalê xwe dî gelek pîr û reh spî  
Digot: Lawo, li nav Gawir tu nexapî

Bi min girt û maç dikir bi qewet  
Min jî her du destên wî maç dikir bi hesret  
Ew kenîya û ez kenîm û me li hev nêrî  
Digot: Lawo, hun tev hatin bi xêrî

Çen roj şûnde em çûne gundekî piçûk  
Li me civiyan keç û kur, jin û bûk  
Ga û golik, ker û çêlek li wê derê  
Bizîn û mî, kar û berxik li bênderê

Berê êvarê yekî bang kir ji gundiya  
Got: Gundîno, heydê em herne dangiya  
Em jî meşîn bi jin, diyan re çûne wir  
Kar û berxên virnîk me bi xwe re bir  
Dema kar û berx gihane pez  
Ez çûme tiliya xwe bi gez  
Bizîn û kar li hev çerîyan  
Mêşîn û berx li hev baniyan

Bi şev ji dengê quraviya  
Hiş û eqlê min reviya  
Roja din em çûne bêriyê  
Werin bibînin xweşiyê



Li nav nefelê û kulîlkan  
Li nav wan em meşiyên hêdîka  
Ji bêhn û hilmê em jîn dibûn  
Ji derd û kulan em dîn dibûn  
Ji bîr nakim ez ti caran  
Wan kanîka û sîka daran  
Gaz û giran û mesîlan  
Cih û warên wan esîlan

Têbînî :

Firat bi xwe nedizanî baş pêk bîne, min jê re nivîsî. Lê ev gotin tev yên Firat in. Li hev anîn, min jî alîkarî wî kir.

Bavê Firat

\*\*\*      \*\*\*      \*\*\*

Birayên hêja û dilovan,  
Mamostê kovara KULÎLK-ê,

Ez kurdekî ji Kurdistana Bakur î ji Nisêbînê me. Lê çî bêjim, îro ji neçarî li Elmanya Rojava jiyana xwe dîbihirînim. Ez ji xwendina zimanê kurdî pir pir hez dikim. Nemaze ji metelok, serpêhatî û helbestan pir hez dikim. KULÎLK min girt ne girt 2-3 caran min ew gah bi girîn, gah jî kenîn min ew xwend. Gelekî pê kêfxweş bûm û KULÎLK-ê hertim dixwînim. Hertim jî çavên min dimînin li riya KULÎLK-ê yan jî PALE û yan jî li riya hinek

pirtûkên din ên ku bi zimanê kurdî tên nivîsan-  
din. Niha jî ez gelek silavên xwe yên dilgermî  
û ji dil û can bo we diyar dikim. Hun bipejirî-  
nin. Birayekî we yî Kurd ji Kurdistana şêrîn.

3. 11. 1980

K. BELENGAZ

BIELEFELD

\*\*\*

\*\*\*

\*\*\*

Ji bo kovara KULÎLK-ê

Di sala 1973 an de karwanekî qaçaxçiyên kar bû, ku  
here bin xetê. Ji birçîbûn û ji tazîbûnê, ji bo ku  
em karibin li ser erda xwe ya dewlemend bikaribin  
parîk nan bixwin û ji xwe re milek çayê bînin, he-  
zar wereqekî me tê de bimîne û em ji xwe re bidî-  
ne arvanekî genim.

Min û hevaleyekî me xwe kar kir û em jî çûn û gihiş-  
tin karwên û di dor gundê Keserbelekê (Qesirbele -  
kê ?) re me xwe berdan ku em herin binya xetê. Me  
nêzîkî li hidûd kir. Eskerên Tirkan bi me hisiyên.  
Rêzana û esker şerekî giran kirin. Di wî şerî de,  
berê tîfîngekê li serê çîçîka wî hevalê min ket.  
Ew hevalê min gelekî li ber dilê min şêrîn bû. Ez  
li ber serê hevalê xwe rûniştim, dîtina ku min dît  
xirxir ketiye kortala çirikê. Ez gelekî pê êşiyam  
û min hêstir li ser barandin. Min hevalê xwe girt  
û hilda milê xwe û bi mirîtî min hevalê xwe ber  
bi paş de vegehand. Min ew anî û ji hukmê tîfîngên  
eskerên Tirkan derxist û ez hatim gund. Min xeber

da dê û bavê wî. Heval jî zewicandî bû. Keçikek û kurikekî wî hebû. Zarokên wî man sêwî. Hê jî ez bi wî û bi zarokên wî têşim.

Min derdê xwe ji gelek tembûrvanan re got. Kesî tu tiştê ser negotin. Vêga min biryar da, ku ez vî derdê xwe ji berpirsîyarê kovara KULÎLK-ê re bişînim, ku helbestekê li ser vî derdê min ji hozanekî wek hozan DILGEŞ yan jî ji hozan BIRÎNDAR re birê kin, ku vî derdê min bînin zimên, ku ez ji xwe re guhdarî bikim û kulê xwe pê birjînim.

Daxwaza min evqas e. Silavên biratî û dilgermî li we. Zor sipas. Kurdek ji Kurdistana Bakur.

7. 11. 1980

GUNDÎ FEQÎR

OSTBEVERN - Elmanya

\*\*\*            \*\*\*            \*\*\*

Ji berpirsîyarê kovara KULÎLK-ê re,

Di ewila vê namê de, ez gelek silavên şoreşgerî û dilgermî li we dikim.

Ez xortekî Kurd im û ji Kurdistana Bakur im. Ez di zanim ku ez Kurd im û welatê min Kurdistan e. Evîna Kurdistanê roj bi roj di dilê min de bêtir dibê, roj bi roj bêtir şaxên xwe berdide nava dil û hinava min, roj bi roj bêtir min evîdarê xwe dike û roj bi roj bêtir min diavêje nava têkoşînê. Agirê evîna Kurdistanê ez birînar kirime, ez derbeder kirime û tu hiş û aqil di serê min de nehîştîye. Em dizanin hete ku welatê me rizgar nebe, em diza-

nin ku heta gelê me ji bindestan dernekeve, ev birîna me ya xedar wê berdewam bibe. Ji bona xelasiya welêt û rizgarkirina gelên me, bê guman, xebat divê. Ji bona vê yekê jî em xebatê dikin û em ê bikin jî. Ev xebat jî di bin ala proleterî û bi zan-yariya marksîzmê û lenînîzmê de tê kirin û wê bê kirin.

Daxwaza min ev e, ku ez ji bona zarokên me yên hêja û delal, ji bona kovara zarokên Kurd yên şagirt KULÎLK, hinek alîkariya xwe pêşkêş bikim. Ger hun vê alîkariya min qebûl bikin, ez ê pir kêfxweş bibim. Ger kêmasiyên min hebin, li min biborin û wan kêmasiyên min bidin bin lingên xwe.

11. 11. 1980

BIRÎNDAR

Elmanya

### AGEHDARÎ

Xwendevanên delal,


Em ji bo namên we, yên ku we ji me re şandine, gelekî sipas dikin. Bi rastî hemû jî gelekî dilgir bûn. Lê mixa bin, ku me nedikarî em gişan li vir çap bikin. Ji ber ku hin ji wan pir dirêj bûn.

Em ji we hêvî dikin, ku hun li me biborin û herweha me ji name, çîrok, mamik, mijûlî, pêkenîn û helbestên xwe bêpar nekin.

Serketina we doza me ye.

KULÎLK

# M I J Û L Î



Gelo navê vî zarokî çî ye ?

Tîpên ku navê wî jê pêk tên, li ser çav û rûyê wî belavkirî ne. Heke tu wan tîpan bigihîni *hev* û lê bixebitî, dê tu navê wî derbixî.

## MERŞA TÎPAN

*Ji şagirtên dibistanê re*

Em şagirt in, em dixwînin, A. B. C.  
Nivîsandin, ew ji me re, armanc e.  
Tîpên me tev sî û yek in, Ç. D. E.  
Xweşî ev e, bi zimanê Kurmanc e.

Ê. F. G. H. him rihet e, him şêrîn.  
Î. I. J. K. xweş dixwînim bi qîrîn.  
L. M. N. O. hê mayîne hinên din.  
Gelî Kurdan, werin tev de bixwînin.

P. Q. R. S. S. T. Û. U. tu meyze.  
V. W. X. ne, ez şaş nakim yek levze.  
Heşt dengdêr in, heçî dengdar bîst û sê.  
Riya ronî dibistan e, ma Y. Z.

HISÊNÊ EMÎN

*Qetrant, 20.12.1943*



## QIJAK Û ROVÎ

Carekê qijakekê ji xwe re perçek penîr peyda kiribû. Rovî wê dibîne, diçe cem qijakê û jê re dibêje:

- Ez heyrana vî dengê te, ev dengê te çiqasî xweş e. Dengê kesî wek yê te ne xweş e. Ca ji xêra xwe re, bi dengêkî ji me re bistrê, ku guhdarî bikin.


Kêfa qijakê gelekî ji pesinvedana rovî re hat. Hema dest bi stranekê kir. Gava stira, perça penîr ji devê wê ket. Rovî jî rahişte penîr û xwar. Bi dû re got:

- Heke yên bêaqil tune bin, dê yên wek min çawan bijîn !



# M I J Û L Î


KÎJAN BAJAR IN ?



Gelo ev kîjan bajarên Kurdistanê ne ? Heke tu cîhên tîpan biguhirîni û wan bigihîni hev, tu ê navên çar bajarên Kurdistanê yên bi navûdeng derbixî.

BERSIV : Ji çor ber bi çer; Qamişlo, Mehabad, Hewlêr û Amed





## ROVIYÊ AQILMEND

Şahê heywanan şêr, rojekê hirçek, qirdek (meymûn) û roviyek vexwendibû mala xwe. Li ber malê, xwarina şêr ya kevn hebû. Bîn ketibû wê xwarinê. Hî na hirç negihîştibû ber malê, gurîni pê ket û bi dengêkî bilind got:

- Ev çi bîn e, ku ji vê derê tê? Wek bîna rêxê ye!

Gotinên hirçê li xweşa şêr neçûn. Şêr hema sîleyek li bin peleguha hirçê xist. Hirç li erdê ket. Bi dû re rabû ser xwe û reviya. Qirdê serê xwe rakir û li pey hirçê ban kir û got:

- Şahê me qenc kir, ku li te xist! Ma tu nabîni, ku ev der wek gulistanê ye û bîna gulên xweş jê tê?

Şêr ji pesinvedanê pir hez nedikir. Ji gotinên qirdê bi hêrs ket. Lepê xwe ji nişkê ve rakir û dikir ku li qirdê bixîne, ew reviya û ji lepên şêr xilas bû.

Dor hatibû rovi. Şêr vegeriya wî û jê pirsî:

- Bi a te, bîna çi ji vê derê tê?

Rovî nedizanibû, ku çi bibêje. Ne diwêrî wek hirçê bibêje, ku bîna ne xweş ji vir tê û ne jî diwêrî wek qirdê bibêje, ku bîna xweş ji vir tê. Rovî hinekê hizirî (fikirî) û bi dû re got:

- Min serma girtiye şahê min, bîna tu tişteki na yê min!

Berî vêya gelê min  
Daketi bûn hêla jêr  
Lê îro bi şûn da  
Herçî Kurd e wê bixwîn

Nezan ma bûn mêr û jin  
Reben pepûk û bêkêr  
Di nav bajar û gunda  
Da ko bibe xweyî şîn

*O. Sebrî*



## QAZ - QAZ

**Allegro**

Qaz - qaz, can - can, de tû we . re

qaz - qaz, can can, can û can.

Qaz-qaz, can-can,  
De tu were qaz-qaz,  
Can-can, can û can.

Qaz-qaz, can-can,  
Qaz-qaz, can-can,  
Qazê canê ez gorî.


Qaz-qaz, can-can,  
Qaz-qaz, can-can,  
Qaza min e kulek e.

Qaz-qaz, can-can,  
Qaz-qaz, can-can,  
Dêre çîtê belek e.

Qaz-qaz, can-can,  
Qaz-qaz, can-can,  
Qaz xeyîdiye xwe nake.

# MIJÛLÎ

XWE DI DEQÎQEKÊ DE BIGIHÎNE MÎR !



Civanê te bi mîr re heye, lê tu bi derengî mayî. Divê tu bilezînî, ku heta bi deqîqekê xwe bigihînî dîwana mîr. Yan na, dê serê te jêbîke... Nabe ku tu qelema xwe ji ser kaxezê rabikî!

## MEGIRÎN ZAROKNO !

Megirîn zarokno, megirîn  
Girî ne karê mêran e  
Dema me, dema wekhevî  
Ne heq e ku zarok bigirîn.

Megirî birazî, tu megirî  
Dema me ne dema girî  
Dema me dema şerekî  
Pir giran, şerê azadî.

Binêre birazî li cîhanê  
Gelek wek te bindest mane  
Di destê wan de tifing e  
Nagirîn, diçin şerê azadî.


Binêre xwarzê li Filîstîn  
Binêre li Dofar û Eritre  
Di destên zarokên wan de  
Her carî top û tifing e.

BIRÎNDAR

Welat bi şev û rojan ez dinalim  
Dûrî te me, bêgane û bê heval im  
Min bo jîna te xweşî tevde berdan  
Ji ber derdan bi ciwanî pîr û kal im

*C. Salar*





Gelo navê vê pisîkê (kitikê) çi ye ?

Heke tu li dû xêzên xiloxarî yên bi hejmaran ve girêdayî herî, dê tu xwe bigihêjîni tîpan. Navê pisîkê jî ji tîpên jorîn yên belavbûyî pêk têt. Lê divê tu li gor rêza hejmaran û ji ya piçûk ber bi ya mezin ve herî. Dibe ku hin hejmar negihêjin tu tîpan û pûç derbikevin. Lê dîsan jî tu her li gor rêza hejmaran herî. Her tîpa ku tu xwe digihêjîni, binivîse. Bi vî awayî tu dê navê pisîkê derbixî.

# M A M I K

1. Spî, spî wek nîvişk,  
Nêvî ter û nêvî hişk.  
-----
2. Tevşo bi tevşo dar dikim,  
Bi nav dikim û nabêjim.  
-----
3. Guhê mişk, tijî rişk.  
-----
4. Ne li erd e, ne li ezman e,  
Hêlîna mîr-begê pehlewan e.  
-----
5. Bi şev bûk e, bi roj pepûk e.  
-----
6. Şiva ter, li guher.  
-----
7. Bizina kej, li ser hej.  
-----
8. Simê gê, tijî xwê.  
-----
9. Siniyek mast, li devereke rast.  
-----
10. Lem-lemo, li ber çemo,  
Ne diz dibin, ne gur dibin.  
-----

10-Qeşa.


5-Lampe, 6-Mar, 7-Moz, 8-Hînar, 9-Heyl

BERSIV : 1-Şeytanok, 2-Tevşo, 3-hêjir, 4-gemi



# M I J Û L Î

## ŞEŞ KALEMÊRÊN WEK HEV



Na, ne rîst e. Her şeş kalemêr jî ne wek hev in. Yek ji wan ji yên din cihêtir e. Gelo kîjan e ?

BERSIV : Hejmar 4

## PÎRÊ Û DÎK

Hebû, tune bû, carekê pîreke bi emir hebû. Pîrê wisan pîr û bi emir bû, ku bi tenê du diran di devê wê de mabûn.

Rojek ji rojan, Pîrê danê xwe dişûşt û li ser xênî radixist. Dîkekî birçî jî hat û du lib ji danê Pîrê xwarin. Pîrê bi hêrs ket û behicî. Rabû çû şûnikek li stûyê Dîkê reben xist û stûyê wî şikand.

Dîkê reben reviya û çû. Çû û çû, çû û çû..û li tepikeke rêxê rast hat. Tepika rêxê got:

- Xêr e, xalê Dîk ? Tu ê bi kû de herî ?

Dîk lê vegerand û got:

- Nebêje xalê Dîk, bêje Dîkil axa !

Tepika rêxê got:

- Dîkil axa, tu ê bi kû de herî ?

Dîk lê vegerand û got:

- Ez ê herim ba eskerê giran,  
Bînim ser Pîra bi du diran,  
Ku stûyê min şikand,  
Ji bo du lib dan.

Tepika rêxê got:

- Ez jî bi te re bêm ?

Dîk lê vegerand û got:

- Were !

Dîk û tepika rêxê bi hev re çûn. Çûn û çûn, çûn û çûn.. û gihan marekî. Mar got:



- Xêr e, xalê Dîk ? Tu ê bi kû de herî ?  
Dîk lê vegerand û got:  
- Nebêje xalê Dîk, bêje Dîkil axa !

Mar got:

- Dîkil axa, tû ê bi kû de herî ?

Dîk lê vegerand û got:

- Ez ê herim ba eskerê giran,

Bînim ser Pîra bi du diran,

Ku stûyê min şikand,

Ji bo du lib dan.

Mar got:

- Ez jî bi te re bêm ?

Dîk lê vegerand û got:

- Were !

Dîk, Tepika Rêxê û Mar bi hev re çûn. Çûn û çûn,  
çûn û çûn.. û rastî gundorekî (bagirdan, bangêr,  
lox) hatin. Gundor got:

- Xêr e, xalê Dîk ? Tu ê bi kû de herî ?

Dîk lê vegerand û got:

- Nebêje xalê Dîk, bêje Dîkil axa !

Gundor got:

- Dîkil axa, tu ê bi kû de herî ?

Dîk lê vegerand û got:

- Ez ê herim ba eskerê giran,

Bînim ser Pîra bi du diran,

Ku stûyê min şikand,

Ji bo du lib dan.

Gundor got:

- Ez jî bi te re bêm ?

Dîk lê vegerand û got:

- Were !

Dîk, Tepika Rêxê, Mar û Gundor tev de vegeyriyan û berê xwe dan ber bi mala Pîrê. Tepika Rêxê kete tifikê, Mar xwe li stûnê gerand, Gundor çû ser xê nî û Dîk jî çû ser darê.

Serê sibehê, gava Pîrê rabû û çû, ku tifika xwe dade, destê wê ket nava rêxê. Çû, ku destê xwe bi stûnê paqij bike, mar bi destê wê ve da. Pîrê re vî û çû ser xênî, ku ji êşa destê xwe bike hawar. Lê gundor bi ser wê de ket û Pîra min û te di bin de ma û mir. Di dawiyê de, Dîk jî bi dilê xwe ban da.

\*\*\*

\*\*\*

\*\*\*

## PÊKENÎN Û KAKILÊN GOTINAN

Rojekê zarokên du cîranan şer dikin. Ji bo vê yekê dê û bavên wan jî pev diçin û dikine şer. Rewş digihêje wê derecê, ku ew zarokên xwe didin piştê xwe û berê xwe didin ber bi dîwanê, da ku gilî bikin.

Zarok bi rê ve li ser piştên bavên xwe bi hev re dipeyîvin û yek ji yê din re dibêje: "Filankes, tu çi dibêjî, gelo hespê min baş dibeze yan yê te? Were em hespên xwe bidin bezê!"

Hema wî çaxî bav ji kirinên xwe yê bêhişiyê poşman dibin û paş de vedigerin.

XACEPIRS



6

1										K		
								2		U		
5								3		L		
								4		İ		
6										L		
										K		
								7		A		
								8		M		
										E		
								10		Y		
11										E		




5

3



8



3



1



7



2



4



9



10



11

## RÊZIMAN Û RASTNIVÎSANDINA KURDÎ

*Dûmahîka hej. 1*

Di alfabeya kurdî de bi tenê 8 tîpên dengdar he-  
ne. 3 ji wan dirêj û 5 ji wan jî kurt in. Ano, -ê,  
î, û - dengdarên dirêj, -a, e, i, o, u- dengdarên  
kurt in. Tîpên mayîn hemû bêdeng in.

Di warê nivîsandinê de divê em bala xwe bidin tî-  
pa bêdeng ya -y-. Heçî -y- ye, xwedî xisûsiyetekê  
ye. Ev xisûsiyet jî ev e, ku her kîjan dengdar di  
be bila bibe, gava tête pêşiya tîpa -y-, tîpa -y-  
wî dengdarî dirêj dike. Ji lew re, heke tîpa -y-  
li dû tîpa -î- yan jî -ê- were, ew dengdar di ni-  
vîsandinê de tên kurt kirin. Ev kurtkirin bi riya  
kum ji serê wan hildanê dibe. Êdî ew wek -i- û -e-  
tên nivîsandinê. Wek:

derî — *lê* — derîyê malê

kerî — *lê* — kerîyê pêz

berî — *lê* — berîya Mêrdînê

terî — *lê* — terîya çûkê

pêşî — *lê* — pêşîya min

dê — *lê* — dêya min , an jî diya min

rê — *lê* — rêya min , an jî riya min


pê — *lê* — pêyê min , an jî piyê min

Bi awayê -derîyê malê- yan jî -rîya min- nivîsan-  
din ne durist e. Şaş e.

Ji bo dengdarê -û- jî çayîdeyek heye. Lê em ê di  
hejmara sisyan de ji vê çayîdeyê kad bikin.

ÊŞA DIRANÊ

# CEMO



Cemo tevî zarokên xwe di şikeftê de razane...



1

Lê êdî xewa Cemo hew dihat Êşa diranê wî diwartir dibû Janê avêtibû mêjiyê wî.



2

Di şikefta tarî de destê xwe peland.



3

Di tîflkê de bi ser qetek dar ve bû



30



Lê tu perengên venemirî di tîfikê de nemabûn.



paşê bere xwe da ber bi aliye hebanan.

Destê wî qû ser kîsê xwe. Gend lib xwe avêtin devê xwe û cûtin...



Dîsan qû ser erzêla xwe û rûnişt... Lê dîsan êşa dirane wî dest pêkir.



Heye ku Hesênîk bike xelîs bike

Ji şikefta xwe derkete der.



Ber bi mala Hesênîk de qû.



Hesenik hema kelpetan  
ajote d'ev  
diranek  
kişand.



17

Devê cemo tişî xwîn bû  
û tîfkire nav xweliyê.



18

Wê kelişkê şewatê diranê  
wî sekînê bû



19



Berê xwe  
da malê

20



Lê eşê  
dîsan  
dest pê  
kir.

21 33



Dîsan berê xwe  
da mala Hesenî

22



Teq!  
Teq!  
Teq!

23



ka qenc nîşan bide Ez kal  
bûme û baş nabînim.

24



Dîsan kelpetan ajote dêx û  
dironek kişand.

25



Devê Cemo tiji xwîn bû û  
tîpkire nar xweliyê.

26



Cemo herê xwe  
da malê.


27



Gê li ser erzêla  
xwe rûnist.

28

34



Di êşê bi hêrs bû. Dîsan qû mala Hesênîk

29



Mala mîrê te bişewite! Ev bûn du diran ku ew bi şaşî dikişîne.

30

Pîrê agir xweş dikir.



Ka pitê alî min bike!

31



Hesênîk vê zarê diranê kurmî qenc nas kir û kişand.

32



Pîrê libek savarê nekeli xiste çîhê diranê kişandî.

33



De oxir be!.. Lê qenc bizane ku di ser min re diranê kêş nîne.

34

DAWI

BERSIVÊN PIRSÊN HEJMARA YEKAN YA KULÏLKÊ

MIJÛLÎ - rûpel: 15

BERSIV : DILOVAN

XAÇEPIRS - rûpel: 18

BERSIV : 1. DIRANÊŞ 2. PIRTÛK 3. JÊBIR  
4. MASÎGIR 5. RASTKÊŞ 6. TÎRAVÊJ  
7. BALAFIR 8. NAME 9. NANPÊJ  
10. DÛRBÎN 11. HESINRÊ 12. SAFOK  
13. KELPETAN 14. POST 15. BÊRIK  
16. COTKAR 17. NÎŞANGIR 18. ROJNAME

Têbînî: Ji ber şaşiya nivîsandinê, di hejma  
ra 17 an de, cîhê tîpekê kê m hatiye  
çêkirin. Em hêvîdar in, ku hun li  
vê kêmasiya me biborin.

MIJÛLÎ - rûpel: 22

BERSIV : hejmar 1 û 3

MAMIK - rûpel: 24-25

BERSIV : 1. DILOP 2. POZ / BÊFIL 3. SOL Û  
MIROV 4. ŞÛR 5. LAMPE  
6. GENIM 7. KUM 8. HEYV  
9. ZÎPIK / TEYROK 10. JÛJÎ



## HA GIDÎ, NARÊ

*Allegretto*

Ha gi - dî, Na - rê, hey Na - rê,  
reş gu - lî bel gî da - rê.

Ha gidî Narê, hey Narê,

Reş gulî belgê darê.

Reş gulî belgê darê,  
Min çavê belek xwarê.

Min çavê belek xwarê,  
Ha gidî Narê, hey Narê.

Nara min derketiye eywanê,  
Ha gidî Narê, hey Narê.

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENINGEN

WEŞANA

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN